HASAN HUSEYÎN DENÎZ

# PÊNGAVA YEKEM

## Ji bo Fêrbûna Zimanê Kurdî



# Pêngava Yekem
# Ji Bo Fêrbûna
# Zimanê Kurdî

14 Tîrmeh 2003

Hasan Huseyîn Denîz

Zimanê Dayika Xwe

Bixwîne

Binivîsîne

Fêrb bibe

Fêr bike

# A



Av

Av diherike.

Av tê vexwarin.

Ev piyaleyeke av e.

Av di piyaleyê de ye.

Ezê avê vexwim.

# B



Bizin

Ev bizinek e.

Ew bizineke boz e.

Bizin li ser tehtê ye.

Bizin şîr dide.

Bizin giya dixwe.

# C



Cawbir

Ev cawbirek e.

Ew caw dibire.

Xwişkê caw bibire.

Ezê caw bibirim.

Min qeteke caw birî.

# Ç



Çav

Ev çavek e.

Ew çavek e.

Çav dinêre.

Çav ji bo nêrînê ye.

Mirov bi çav dibîne.

# D



Dest

Ew du dest in.

Destek mezin e.

Destek biçûk e.

Destê biçûk ê min e.

Destê mezin ê te ye.

# E



Ewr

Ev ewr in.

Ew ewrên spî ne.

Ewr li ezman çêdibin.

Ewr baranê dibarînin.

Ewr berfê jî dibarînin.

# Ê



Êzing

Êzing darên hişk in.

Êzing ji bo şewatê ne.

Êzing dişewitin.

Êzing agir derdixin.

Agir germahiyê dide.

# F



Firoke

Ev firoke ye.

Ew firokeyek e.

Firoke difire.

Ew li ezman difire.

Firoke rêwingiyan dibe.

# G



Gulberoj
Ew gulberoj e.
Gulberoj dendikan dide.
Rengê gulberojê zer e.
Dendikên gulberojê reş in.
Berê gulberojê li rojê ye.

# H



Hêlîn

Ev hêlînek e.

Ew hêlîna çûkan e.

Di hêlînê de hêk hene.

Hêlîn mala çûkan e.

Çûk di hêlînê de dijîn.

# X



Xox

Ev xox in.


Ew gelek xox in.

Xox tên xwarin.

Xox fêkî ye.

Xox li ser darê çêdibin.

# I



“ I ” tîpek e.

“ I ” tîpeke dengdêr e.


“ I ” nayê serê navan.

“ I ”tîpa diwazdemîn e.

“i” ya biçûk bi xal e.

Ev “ i ” ya biçûk e.

# Î



Îsot

Ev îsot in.

Îsotek tûj e, yek şêrîn e.

Îsotek kesk e, yek sor e.

Îsota sor tûj e.

Îsot devê mirov dişewitîne.

# J



Jinemal

Ew jinemalek e.

Jinemal li malê ye.

Jinemal nan dipijîne.

Du zarokên Jinê hene.

Ew jineke jêhatî ye.

# K



Kîvroşk

Ev kîvroşk e.

Ew kîvroşkek e.

Ew kîvroşkeke spî ye.

Kîvroşk li ser berfê ye.

Kîvroşk li bin darê ye.

# Q

Qeresî



Ev qeresî ne.

Qeresî fêkî ye.

Qeresî tên xwarin.

Qeresî di tasê de ne.

Rengê qeresiyan sor e.

# L



Lênûs

Ev lênûsek e.

Lênûs ji bo nivîsê ye.

Pênûs li ser lênûsê ye.

Lênûs ji rûpelan pêk tê.

Lênûsa min heye.

# M



Masî

Ew masî ne.

Masî di avê de dijîn.

Masî melevaniyê dikin.

Ew pênc masî ne.

Masî tên xwarin.

# N



Neft

Neft dişewite.


Ev çala neftê ye.

Neft di bin erdê de ye.

Neft li Kerkukê heye.

Ew nefta kurdan e.

# o



" o ", tîpek e.
Ev " o " ye.
" o " tîpeke dengdêr e.
" o " girover e.
Ode
Ol

# P



Pênûs

Ev pênûsek e.

Pênûs ji bo nivîsê ye.

Pênûseke min heye.

Pênûsa min reş e.

Ew pênûseke hibrîn e.

# R



Rê

Ev rê ye.

Ew rêya qîr e.

Rê ji bo rêveçûnê ye.

Ez li ser rê dimeşim.

Rê diçe gundê me.

# S



Sivorî

Ev sivoriyek e.

Sivorî gozan dixwe.

Sivorî li ser darê dijî.

Sivorî ajalek e.

Sivorî ajaleke rengîn e.

# Ş



Şûşe

Ev şûşe ne.

Ew gelek şûşe ne.

Ew şûşe, bi qapax in

Şûşe rêzkirî ne.

Ew şûşeyên derman in.


# T



Teyr
Ew teyr in.
Teyr difirin.
Baskên teyran hene.
Ew gelek teyr in.
Teyr li jorê ne.

# U

Ev tîpa “ U “ ye.



“ U “ tîpek e.


“ U “ tîpeke dengdêr e.

“ U “ nayê serê navan.

Ev “ u “ ya biçûk e.

“U“ dikeve nava peyvan.

# Û




Ev tîpa " Û " ye.

" Û " tîpeke dengdêr e.


" Û " nayê serê navan.

" Û " tîpeke navgîn e.

Ev " û " ya biçûk e.

Kum(^)li serê "û" heye.

# V



Vekirî

Derî vekirî ye.

Ez derî vedikim.

Tu derî vedikî.

Min derî vekir.

Te derî vekir.

# W



Werdek

Ev werdek in.

Ew sê werdek in.

Werdek dimeşin.

Werdek dikevin avê jî.

Ew ajalên melevan in.

# y



Yek

Ev hijmara " 1 " ê ye.


Ew hijmara yekemîn e.

Yek, tenê ye.

Yek hijmareke kit e.

Ez yek kes im.

# Z



Zebeş

Zebeş sewze ye.

Ew qetekî zebeşê ye.

Zebeş bi dendik e.

Zebeş şêrîn e.

Zebeş li Amedê çêdibin.

Em tîpên kurdî fêr bûn.
Ez tîpê kurdî fêr bûm.
Dikarim tîpên kurdî bêjim:

A, B, C, Ç, D, E, Ê, F, G, H, X,
I, Î, J, K, Q, L, M, N, O, P,
R, S, Ş, T, U, Û, V, W, Y, Z

Tîpên biçûk jî hene.
Dikarim ên biçûk jî bêjim:

a, b, c, ç, d, e, ê, f, g, h, x, i, î,
j, k, q, l, m, n, o, p, r, s, ş, t, u,
û, v, w, y, z

Tîpên kurdî bijmêre.
Çend tîpên kurdî hene?
31 tîpên kurdî hene.
Çend tîp dengdêr in?
8 tîp dengdêr in.
Tîpên dengdêr bêje.
Ez tîpên dengdêr dibêjim:
A, E, Ê, I, Î, O, U, Û

Tîpên din tev dengdar in.
23 tîpên dengdar hene.
Ez dikarim wan jî bêjim:
B, C, Ç, D, F, G, H, X, J, K,
Q, L, M, N, P, R, S, Ş, T, V,
W, Y, Z

EZ

Ez Rewşenê me.



Navê min Rewşen e.

Ez keç im.

Ez keçikek im.

TU

Tu Rewşen î.

Navê te Rewşen e.



Tu keç î.

Tu keçikek î.

Ez Rodî me.

Navê min Rodî ye.

Ez kur im.

Ez kurikek im.

## EW

Ew Kerem e.

Kerem kurek e.



Ew hevalê min e.

## EM

Em zarok in.

Em gelek zarok in.



Em keç û kur in.

Em hevalê hev in.

## HÛN

Hûn jî zarok in.



Hûn tev keç in.

Hûn pênc zarok in.

# EW



Ew xwendevan in.
Ew jî zarok in.
Ew şeş zarok in.
Ew hemû keç in.
Ew diçin dibistanê.

**Kî xwendevan e?**



Ez xwendevan im.
Tu xwendevanî.
Ew xwendevan e.
Em xwendevan in.
Hûn xwendevan in.
Ew xwendevan in.

# MIN




Min tacek çêkir.
Ew taceke zer e.
Min tac ji kulîlkan çêkir.
Ew kulîlkên zer in.
Tac li ser serê min e.

# TE



Te tacek çêkir.
Ew jî taceke zer e.
Kulîlkên te jî zer in.
Tac li ser serê te ye.

# WÎ



Wî tacek çênekir.
Taca wî nîne.
Ew bê tac e.

WÊ

Wê tacek çêkir.

Taceke wê heye.

Taca wê jî zer e.

Ew jî keçikek e.



ME



Me tac çêkirin.

Me du tac çêkirin.

Me tacek çêkir.

Tacên me jî zer in.

WE



We tac çênekirin.

Tacên we nînin.

We çima tac çênekirin?

WAN

Wan jî tac çênekirin.



Wan tacek çênekir.

Wan tac çênekirin.

Wan du tac çênekirin.

Wan gelek tac çênekirin.

Tacên wan nînin.

Ew bê tac in.

Çima tacên wan nînin?

Taceke min heye.





Taceke te heye.

Taceke wî heye.

Taceke wê heye.

Tacên me hene.

EV



Ev sêv e.  

Ev sêvek e.

Ez sêvekê nîşan dikim.

Ev sêveke sor e.

EW

 Ew morî ye. 

Ew moriyek e.

Ew moriyeke reş e.

Ew ji sêvê dûrtir e.


Sêv li nêzîk e.

Morî li dûr e.

Cihê sêvê nêzîkê min e.


Cihê moriyê dûrî min e.

VAN

Van sêvan bixwe. 

Van sêvan bijmêre.

WAN



Wan sêvan bixwe.

Wan sêvan bijmêre.

VÎ



Vî çûkî bigre.

Li vî çûkî binêre.

Ev çûkekî rengîn e.

WÎ



Wî çûkî bigre.

Li wî çûkî binêre.

Ew çûkekî rengîn e.

VÊ

Vê darê biparêze.



Vê darê av bide.

Ev dareke hişîn e.


WÊ

Wê darê biparêze.




Wê darê av bide.

Ew dareke hişîn e.



VAN

Van çûkan bijmêre.



Wan daran av bide.

1



Yek

Perperîkek.

Ev perperîkek e.

Ew perperîkek e.

2



Du

Du perperîk.

Ew du perperîk in.

3



Sê

Sê perperîk.


Ew sê perperîk in.

4

Çar

Çar perperîk.

Ev çar perperîk in.




5

Pênc

Pênc gog.

Ew pênc gog in.




6

Îsot


Şeş îsot.

Ev şeş îsot in.

Ew sê cot in.



7




Heft

Heft mêş.

Ew heft mêş in.

8




Heşt

Heşt garis.

Ev heşt garis in.

Ew heşt garis in.



9

Çîçik

Neh çîçik.

Ev çîçikên mirîşkê ne.

10

Deh

11

Yazdeh

12

Diwazdeh

13

Sêzdeh

14

Çardeh

15

Pazdeh

16

Şazdeh



Van zarokan bijmêrin.

17

Hivdeh

18

Hijdeh

19

Nozdeh

20

Bîst

30

Sîh

40

Çel

Çil

50

Pêncî



Di vê wêneyê de

Çend gulên sor hene?

Bijmêrin

60

Şêst

70


Heftê

80

Heştê

90

Nod



100

Sed

1 000

Hezar

1 000 000

Milyon

Milyar 1 000 000 000

Di vê wêneyê de

Çend kulîlk hene?

Bijmêrin.

## KESK



Şînatî kesk e.

Dar hişîn in.

Pelên daran kesk in.

Giya kesk e.

Kevz jî kesk e.

Çavên kesk jî hene.

## SPÎ



Av spî ye.

Berf jî spî ye.

Spî kombûna hemû rengan e.

Şîr spî ye.

Mast spî ye.

Rengê pemboyî jî sipî ye.

## SOR



Ev gul sor e.
Xwîn jî sor e.
Sor rengê rojê ye.

## ZER



Ev kulîlk zer in
Şima jî zer e.
Zerdika hêkê zer e.

## ŞÎN



Ezman şîn e.
Ezman li jorê ye.
Teyr li ezmanan difirin.
Behr jî şîn e.

## REŞ



Şev reş e.

Reş tarî ye.

Hîv bi şev derdikeve.

Stêrk jî bi şev derdikevin.

Mirov bi şev dinive.

Porên reş hene.

Çavên reş jî hene.

## QEHWEYÎ



Ev qehwe ye.

Qehweyî rengê qehwê ye

Ev fîncaneke qehwê ye.

Rengê axê jî qehweyî ye.

Çavên qehweyî jî hene.

# ÎROJ

Ez îroj li malê me.
Ez îroj li malê bûm.
Ezê îroj li malê bim.

Tu îroj li malê yî.
Tu îroj li malê bû.
Tê îroj li malê bî.

Ew îroj li malê ye.
Ew îroj li malê bû.
Ewê îroj li malê be.

Em îroj li malê ne.

**Kî îroj li malê bû?**

Em îroj li malê bûn.
Emê îroj li malê bin.

Hûn îroj li malê ne.
Hûn îroj li malê bûn.
Hûnê îroj li malê bin.

Ew îroj li malê ne.
Ew îroj li malê bûn.
Ewê îroj li malê bin.

Ma îroj em li malê bûn?
Na, em îroj ne li malê bûn.
Belê, em îroj li malê bûn.

# SIBÊ

Ezê sibê biçim sûkê.
Ez sibê diçim sûkê.
Tê sibê biçî sûkê.
Tu sibê diçî sûkê.
Ewê sibê biçe sûkê.
Ew sibê diçe sûkê.

Emê sibê biçin sûkê.
Em sibê diçin sûkê.
Hûnê sibê biçin sûkê.
Hûn sibê diçin sûkê.
Ewê sibê biçin sûkê.
Ew sibê diçin sûkê.

DOH

Ez doh çûm firoşgehê.

Ez doh çibûm firoşgehê.

Min doh tu li firoşgehê dît.

Tu doh çû firoşgehê.

Tu doh çûbû firoşgehê.

Te doh ez li firoşgehê dîtim.

Ew doh çû firoşgehê.

Ew doh çûbû firoşgehê.

Wê em li firoşgehê dîtin.

Wî em li firoşgehê dîtin.

Em doh çûn firoşgehê.

Em doh çûbûn firoşgehê.

Me tu li firoşgehê dît.

Me hûn li firoşgehê dîtin.

PÊR

Ez pêr ji kargehê hatim.
Ez pêr ji kargehê dihatim.
Ez pêr ji kargehê hatibûm.
Tu pêr ji kargehê hatî.
Tu pêr ji kargehê dihatî.
Tu pêr ji kargehê hatibûyî.
Ew pêr ji kargehê hat.
Ew pêr ji kargehê dihat.
Ew pêr ji kargehê hatibû.
Em pêr ji kargehê hatin.
Em pêr ji kargehê dihatin.
Em pêr ji kargehê hatibûn.
Hûn pêr ji kargehê hatin.
Ew pêr ji kargehê hatin.

## ÎSAL

Îsal wê bihar xweş be.
Ezê îsal biçim zozanan.
Ez îsal diçim zozanan.

## PAR

Par bihar xweş bû.
Ez par çûm zozanan.
Ez par çûbûm zozanan.
Ez par diçûm zozanan.

## PÊRAR

Pêrar bihar xweş bû.
Ez pêrar çûm zozanan.
Ez pêrar çûbûm zozanan.

## SALA BÊ

Ezê sala bê biçim deştê.
Tê sala bê biçî deştê.
Ewê sala bê biçe deştê.
Emê sala bê biçin deştê.
Hûnê sala bê biçin deştê.
Ewê sala bê biçin deştê.

## ÇILE

Çile sar e.
Berf Çile dibare.
Çile meha yekemîn a salê ye.
Çile meheke ji zivistanê ye.
Yekê Çileyê sersal e.

## SIBAT

Sibat jî sar e.
Sibat meha duwemîn e.
Sibat meheke zivistanê ye.

## ADAR

Adar destpêka biharê ye.
Adar meha sêyemîn e.
Giya Adarê şîn dibe.
Dar Adarê dibişkivin.
Baran Adarê dibare.
Adar xweş e; ew cejn e.
Newroz di Adarê de ye.
21 ê Adarê roja Newrozê ye.
Di Newrozê de agir dadidin.

## NÎSAN

Nîsan meha çaremîn e.
Ew jî meheke ji biharê ye.
Kulîlk Nîsanê vedikin.
Kulîlkên Nîsanê sor in.

## GULAN

Meha dawiya biharê Gulan e.
Gulan meha pêncemîn e.
Gulan meha şehîdan e.

## HEZÎRAN

Ev meha destpêka havînê ye.
Hezîran germ e.
Hezîran meha şeşemîn e.

## TÎRMEH

Tîrmeh jî meheke havînê ye.
Tîrmeh pir germ e.
Tîrmeh meha heftemîn e.

## TEBAX

Ev meheke havînê ye.
15 ê Tebaxê Cejna Kurdan e.
Tebax jî germ e.
Tebax meha heştemîn e.

## ÎLON

Îlon destpêka payizê ye.
Ba îlonê radibe.
Îlon meha nehemîn e.

## COTMEH

Cotmeh meheke payizê ye.
Mirov Cotmehê erd cot dike.
Cotmeh meha dehemîn e.

## MIJDAR

Mijdar jî meheke payizê ye.
Ew meha dawiya payizê ye.
Mijdar meha yazdemîn e.

## KANÛN / BERFANBAR

Ev destpêka zivistanê ye
Kanûnê serma dest pê dike.
Kanûn meha diwazdemîn e.
Kanûnê sal bi dawî dibe.

## BIHAR

Bihar demsala yekemîn e.
Biharê berf dihile.
Biharê giya şîn dibe.
Biharê pez dizê.
Sê mehên biharê hene:
Adar , Nîsan , Gulan

## HAVÎN

Havîn demsala duwemîn e.
Havîn demsaleke germ e.
Zad havînê diseride.
Havînê dibistan bi dawî dibe.
Sê mehên havînê hene:
Hezîran , Tîrmeh , Tebax

## PAYIZ

Payiz demsala sêyemîn e.
Payizê ba radibe.
Dar pelên xwe diweşînin.
Giya zer û hişk dibe.
Baran dest pê dike.
Sê mehên payizê hene:
Îlon , Cotmeh , Mijdar

## ZIVISTAN

Zivistan demsala çaremîn e.
Zivistan sar e.
Zivistanê berf dibare.
Sê mehên zivistanê hene:
Kanûn , Çile , Sibat

## SAL

Salek diwazdeh meh in.

Salek 12 meh in.

Salek pêncî û du hefte ne.

Salek 52 hefte ne.

Salek 365 roj in.

## MEH

Mehek 30 roj in.

Hinek meh 31 roj in.

Sibat 28 roj dikişîne.

Sibat 29 jî dikişîne.

Mehek çar hefte ne.

Ji mehê re 'Hîv' jî dibêjin.

Hîv li ezmanan e.

# ROJ

Rojek 24 saet in.
Çar danê rojê hene:
Sibe , Nîvro , Êvar , Şev
Sibe û Nîvro ronahî ne.
Êvar û Şev tarî ne.
Roj sibehê derdikeve.
Roj nîvro bilind dibe.
Roj êvarî diçe ava.
Roj bi şevê nayê dîtin.
Şevê hîv û stêrk derdikevin.
Şev tarî ye.
Şevê lempe tên pêxistin.
Mirov bi şev dinive.
Mirov bi roj kar dike.

Kî dikare navê rojan bijmêre?
Ez dikarim bijmêrim.
Bijmêre.
Ez navê rojan dijmêrim:


| | |
|---|---|
| Yek: | YEKŞEM |
| Du: | DUŞEM |
| Sê: | SÊŞEM |
| Çar: | ÇARŞEM |
| Pênc: | PÊNCŞEM |
| Şeş: | ÎN |
| Heft: | ŞEMÎ |

Hefteyek heft roj in.
Di hefteyekê de heft roj hene.
Yekşem roja behnvedanê ye.

Duşem roja despêkirina kar e.
Roja Şemiyê hefte bi dawî dibe.
Roja şemiyê dibistan jî bi dawî dibe.
Rojek 24 saet in.
Ez bi roj xew nakim.
Ez bi roj diçim dibistanê.
Ez bi roj diçim kargehê.
Ezê şemiyê werim mala we.
Ezê roja şemiyê werim.
Ez roja yekşemê çûm sûkê.
Ez yekşemê çûm sûkê.
Tu kîjan rojê çû sûkê.
Ez roja sêşemê çûm sûkê.
Roja çarşemê hevdîtin heye.
Sibê çarşem e.


# DEMJİMAR

Demjimar "SAET" e
Demjimarek 60 hûrdem e.
Hûrdem, deqîqe ye.
Hûrdemek 60 çirk e.
Çirk, saniye ye.
Çirkek 60 sanîse ye.
Saetek ji çar çarîkan pêk tê.
Her çarîkek 15 hûrdem e.
Du çarîk dikin nîv saet.




Saet çi ye?
Demjimar çi ye?
Saet sê ye.
Demjimar sê ye.

Demjimar sisê ye.
Saet ji sê çarîkek dibore.
Saet ji sisyan çarîkek dibore.
Saet sê kêm çarîk e.
Saet sê kêm çarîkek e.
Saet sê kêm deh e.




Saet çend e?

Saet heşt kêm deh e.




Saet çend e?
Saet deh û sêzdeh e.
Saet ji dehê sêzdeh dibore.

“Nezanbûn ne şerm e,
Nefêrbûn şerm e!"

# PÊNGAVA YEKEM

Ji bo fêrbûna Kurdî

14 Tîrmeh 2003

Hasan Denîz

Dola Kokê-Çiyayê Qendîl


Zimanê Dayika Xwe
BIXWÎNE
BINIVÎSÎNE
FÊR BIBE
FÊR BIKE